Beşa Perwerdeyê ya NSW

Behaviour code for students

Information for students and parents or carers

# Koda reftarê ji bo xwendekaran

## Agahdarî ji bo xwendekar û dê û bav an parêzvanan

Dibistanên giştî yên NSW ji bo her kesî li ser gelek eyaran, ji bo hawirên hînbûnê yên ewle, piştevan û bersivdar peywirdar in. Em di xwendekarên xwe de reftarên têkel û ewle hîn dikin û nimûne dikin.

### Di dibistanên giştî yên NSW de, xwendekarên pêşniyarên ku heta karibin:

- hurmetê nîşanî xwendekarên din, mamosteyên wan û karmendên dibistanê û endamên civakê bidin
- rêzikên dibistan û polê bişopînin û rêûresmên mamosteyên xwe bişopînin
- di fêrbûnê de ji bo pîvanên herî bilind têdikoşin
- ji bo ku hemû endamên civatê yên dibistanê bi nirx, tevlî û piştevaniyê bibin, bi rengekî dadmend û hurmetkar tevbigerin
- bi rêzdarî, aramî û adilane nakokiyan çareser bikin
- bi polîtîkaya yekform ya dibistanê ya lihevkirî yan jî koda cilûbergan pêk bînin
- her roj biçin dibistanê (ji bilî eger bi awayekî yasayî bexşandî bin)
- rêz ji hemû mal û milkan re bigirin
- bi ewle bin û tundiyê nekin an jî çek, dermanên neqanûnî, alkol, vêp, cixareya êliktornî an jî tûtin bînin dibistanên me
- li dibistanên me li dijî tu kesî zordestî, destdirêjî, çavtirsandin û cudahî neyê kirin.

Dibistan li hemberî reftarên ku ji bo xwe an jî yên din zirarê didin an jî ji bo bidestxistina hînkirin û fêrbûna bi kalîteyeke bilind, çalakiyan dikin.

### Mafê hemû xwendekaran heye ku:

- ewlehîya li dibistanê
- bigihên û bi temamî beşdarî fêrbûna wan bibin
- ji aliyê xwendekar, mamoste û xebatkarên dibistanê yên din ve bi rêzdarî bê muamelet kirin
- nêrînên xwe bînin ziman, armancan diyar bikin û xweparêziyê bikin.

Mûdûr û karmendên dibistanê, bi bikaranîna biryarên xwe ya profesyonel, ji bo parastina nîzamê û peydakirina qadên fêrbûna ewle, piştgir û bersivdar û pêkanîna çalakiyên guncaw gava xwendekar van bendewariyan pêk naynin.

Beşa Perwerdeyê berpirsyar e ji peydakirina çarçoveyeke siyasetê û çavkaniyên wekî nûçeyên pirsgirêkên qanûnî, gihandina şêwirmendiyên pisporî û fêrbûna pîşeyî ji bo rêberîkirina mûdûr û karmendên wan di pêkanîna daraza xwe ya pîşeyî.

Di vê çarçoveyê de hikûmeta NSW û Beşa Perwerdeyê dê li ser asta herêmî piştgirya desthilat û hikmê rêvebir û karmendên dibistanan bike.

### Koda reftarê ji bo xwendekaran: Çalakiyên xwendekaran

Pêşvebirina tevlêbûn, fêrbûn, tendirûstî û ewlehîya hemû xwendekarên li dibistanên dewletê yên NSW'ê, ji bo Beşa Perwerdeyê pêşekî bilind e.

Em rêbazên hînkirin û hînbûnê li seranserê gelek eyarên ku ji bo pêşxistina hunerên ku xwendekar ji bo pîvanên me yên bilind ên ji bo hurmet, ewleû û tevgerên têkildar pêk bînin, pêk tînin.

**Ji bo pêkanîna bendewarîyên ku li jor hatine dîyar kirin, divê xwendekarên li dibistanên giştî yên NSW, bi baştirîn şiyana xwe, li gorî prensîbên jêrîn tev bigerin.**

### Rêz

- Hevdu bi rûmetî muamele bikin.
- Têkiliyê deynin û bi hurmet îsbat bikin.
- Bi xwendekar, mamoste û xebatkarên dibistanê yên din re bi hevkarî tevbigerin û bixebitin.
- Têkiliyên erênî û bi hurmet pêş bixin.
- Qîmetê bidin berjewendî, şiyan û çanda kesên din.
- Rêz ji pêdawîstîyên fêrbûna xwendekarên din re bigirin.
- Cilên guncav li xwe bikin bi lixwekirina unîformaya dibistanê ya lihevkirî an jî koda cilan.
- Li mal û milkên dibistanê û milkên karmend û xwendekarên din miqate bin.

NSW GOVERNMENT

### Ewlehî

- Li dorî reftar û reftaran rêzik û bendewariyên dibistan û polê bikin û bişopînin.
- Danûstandin û çareserkirina nakokiyan.
- Hay ji xwe hebin û berpirsîyarîya xwe li ser ewê yekê bigirin ku reftar û kirdarên wan çawa bandorê li hinekên din dikin.
- Li xwe û yên din miqate bin.
- Di ewlehiyê de bin û alîkariya kesên din bikin ku bijarteyên ewle ku xwe yan jî yên din neêşînin.

### Tevlêbûn

- Di dema xwe de bigihêjin dibistan û polê.
- Ji bo her dersê amade bin.
- Bi awayekî çalak beşdarî fêrbûnê bibe.
- Hewil didin û ji bo bidestxistina pîvanên herî bilind ên hînbûnê têdikoşin.

### Xizmeta wergerandina li ser telîfonê

Heger hûn agahîyên bêtir bixwazin ji kerema xwe li mûdûrê dibistanê bigerin. Eger ji bo alîkarîya lêpirsîna we hewcehîya we bi wergêrekî hebe, ji kerema xwe di 131 450 de li Xizmeta Wergêran a Telîfonê bigerin û bi zimanê xwe wergêrekî bixwazin.

Ji operatorê re hejmara telîfonê ya ku hûn dixwazin lê bigerin bibêjin û ji bo ku di axaftinê de bibe alîkar, wê operator li ser xetê wergêrekî bistîne. Ev xizmet belaş e.